Hallo
Basel-Stadt

Kanton Basel-Stadt

# Tenduristî

Sazûmana tenduristiyê
Sîgorteya nexweşî û qezeyê
Lênêrîna bijîjkî
Ducanîbûn / zarokanîn
Tenduristiya derûnî
Rewşa mirinê

# Sazûmana tenduristiyê

Li Swîsreyê sazûmana tenduristiyê pir baş hatiye avakirin. Hemû niştecî bi awayekî berfireh û pêwîstî li hember qeze û nexweşiyê hatine ewlekirin (sîgorte). Jimareke pir a mûayenexane, dermanfiroş û nexweşxaneyan, karê sehkirin û tedawîkirinê ewle dikin.

## Sazûmana ewlehiyê/sîgorte

Li Swîsreyê, divê hemû niştecî li hember qeze û nexweşiyan werin ewlekirin (sîgortekirin). Kî bikeve welêt, divê di nav sê mehên pêşî yên piştî hatina xwe de sîgortayê çêke. Divê zarok piştî jidayikbûnê, di nava sê mehan de werin sîgortekirin. Xizmetên sîgorteyên pêwîst di zagonan de hatine diyarkirin. Hemû kesên sîgortekirî xwediyê mafê heman sehkirina bijîjkî ne.

## Debarî / Fînansekirin

Sazûmana tenduristiyê ya Swîsreyê bi awayekî hevbeş ji aliyê dewlet (Konfedere, Kanton, Şaredarî), karsaz û kesên taybet ve tê fînansekirin. Kesên taybet ji bo sîgorteya tenduristiyê û sîgorteya qezeyê tibabeke mehane ya prîma sîgortayê didin. Ev her sal tê tespîtkirin û li her kantonekê cudatir e. Kî nexweş bikeve yan qezeyekê bike, divê ew bi xwe jî tev li mesrefê bibe (Franchise û para xwe bide, Franchise und Selbstbehalt). Lê li vê derê sînorekî tibaba herî zêde ya salane heye.

## Werger / tercume

Gava mirov pêwîst dimîne bi zimanekî biyanî bi bijîjkan, dermanfiroşan an hemşîreyan re bideûbistîne, ne hêsan e. Ji ber vê yekê hinek nexweşxane wergeriya belaş bi riya wergerên navçandî yên bi taybetî hatine perwerdekirin, pêşkêş dikin. Divê nexweş di demê de xwe li ser vê yekê agahdar bikin. Hûn dikarin ji bo serdana bijîjk an rewşên din kesên wergerê dikin veqetînin. Lê wê demê, divê hûn bi xwe heqdestê wan bidin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/gesundheitssystem

# Sîgorteya nexweşî û qezeyê

Kî li Swîsreyê rûdine, divê sîgorteyeke xwe ya qeze û nexweşiyê hebe. Sîgorteyên taybetî di rewşên qeze, nexweşî yan ducanîbûnê de mesrefan digirin ser xwe. Piştî hatina Swîsreyê di nav sê mehên destpêkê de, divê her du sîgorte werin çêkirin.

## Sîgorteya tenduristiyê / Sîgorteya bingehîn

Divê hemû nişteciyên li Swîsreyê bi xwe sîgorteyeke nexweşiyê (Sîgorteya bingehîn, Grundversicherung) bidin çêkirin. Kî were Swîsreyê ji bo vê sê meh dema xwe heye. Ger mirov di van sê mehan de nexweş bikeve, mesref wê bi awayê paş de werin hesapkirin. Sîgorteya bingehîn ji aliyê jimareke zêde yên şîrketên sîgorteya nexweşiyê (Krankenkassen) yên taybetî ve tên pêşkêşkirin. Hilbijartina şîrketa sîgortaya nexweşiyê azad e. Divê ev şîrketên sîgorteya nexweşiyê hemû kesên li Swîsreyê dimînin qeyd bikin. Kesên tên sîgortekirin tibabeke (prîmeke) mehane didin. Ev tibab (prîm) li gor şîrketa sîgorteya nexweşiyê û modela sîgorteyê bilind dibe, ji bo wê, divê mirov derfetên ew pêşkêş dikin bide ber hev. Mirov dikare şîrketa sîgorteya nexweşiyê herwiha heta dawiya mijdarê ji bo sala bê biguherîne. Sîgorteya bingehîn ne tenê mesrefên gava mirov nexweş bikeve dide, ew ji bo ducanîbûn û zarokanînê jî dide. Xizmetên wan bi zagonê hatine diyarkirin.
Baldarî: Mesrefên tedawiya diranan an berçavkan bi gelemperî, divê bi xwe bidin an jî di ser sîgorteyeke alîkar a dildarî re were hesapkirin.

## Sîgorteya qezeyê

Kesên di karekî de bi cî bûne, ger di hefteyekê de zêdeyî 8 saetan dixebitin, bi awayekî jiberxwe (otomatîk) ji aliyê karsaz ve li hember qezeyên di dema kar de û di dema vala de tên sîgortekirin. Kesên ji vê kêmtir dixebitin, di demên vala de ne sîgortekirî ne û divê ew bi xwe li ser sîgorteya xwe ya qezeyê rawestin. Ev yek ji bo hemû kesên serbixwe kar dikin û kesên kar nakin jî derbasdar e. Kesên kar nakin, divê xwe li ba şîrketa sîgorteya xwe ya nexweşiyê li hember qezeyan sîgorte bikin. Kesên serbixwe kar dikin jî dikarin li ba şîrketên din ên sîgortayê, ewlehiya qezeyê çêkin. Divê kesên sîgortekirî tibabekî (prîmeke) mehane bidin. Ji bo kesên di karekî de bi cî bûne, ev yek rasterast ji mehaneya wan tê qutkirin.

## Kêmkirina tibabê (prîma) tê dayîn

Kesên nikarin tibaba sîgorteya nexweşiyê bidin, di hin mercan de dikarin daxwaza kêmkirina tibaba (prîma) (Prämienverbilligung) sîgortaya bingehîn bikin. Ji bo bidestxistina kêmkirinê, divê mirov formeke serlêdanê bişîne û agahiyên maldarî û hatineya xwe nîşan bide. Ger serlêdan were pejirandin, mirov ji meha bê û wir de kêmtir prîmê dide. Saziya alîkariya civakî (Amt für Sozialbeiträge) li ser kêmkirina prîmê agahiyan dide û qeydkirinê dipejirîne.

## Sîgorteyên alîkarên sîgorteya bingehîn

Mirov dikare bi awayekî dildarî sîgortayên alîkar ên cihêreng (Zusatzversicherungen) ji bo sîgorteya pêwîst a bingehîn, bide çêkirin. Ev sîgorteyên alîkar ji bo mesrefên ji aliyê sîgorteya bingehîn ve nayên dayîn, wek mînak ji bo tedawîkirina diranan tên çêkirin. Sîgorteyên alîkar hema hema ji aliyê hemû şîrketên sîgorteya nexweşiyê ve tên pêşkêşkirin. Şîrketên sîgorteya nexweşiyê dikarin bi xwe biryarê bidin, bê ew dixwazin hin kesan sîgorte bikin an nekin û ew dikarin şertûmercan bidin pêş.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/kranken--und-unfallversicherung

# Lênêrîna bijîjkî

Kî nexweş bikeve yan qezeyekê derbas bike, divê ew di piraniya rewşan de destpêkê biçe ba bijîjka malê/bijîjkê malê. Mirov dikare ji bo nexweşiyên sivik an qezeyên biçûk ji dermanxaneyan jî alîkariyê bistîne. Divê mirov tenê di rewşên bi rastî giran û lezgîn de, rasterast biçe nexweşxaneyê.

## Dermanxane

Dermanxane dermanên ji aliyê bijîjkan ve bi reçeteyê hatine nivîsîn û hemû dermanên din difiroşin. Ji bo nexweşiyeke sivik, tê pêşniyarkirin, ku mirov destpêkê biçe dermanxaneyekê. Kesên dermanfiroş baş hatine perwerdekirin û şêwirmendiyê ji muşteriyên xwe re dikin. Dermanxaneya rewşa lezgîn a li kolana Petersgraben 3, bi şev û dawiya hefteyê jî vekirî ye û mirov dikare li wê derê dermanên rewşa lezgîn peyde bike.

## Bijîjkên malê /Bijîjkên zarokan

Li Swîsreyê bijîjkekî malê yan bijîjkeke malê (Hausarzt oder Hausärztin) yê gelek kesan heye. Ev bijîjk çîroka nexweşiya we dinasin û di rewşên dermankirinê de ciyê yekem ên serlêdanê ne. Ji bo zarokan bijîjkên zarokan hene. Gava pêwîst be, ew nexweşan dişînin bijîjkên pisporên beşa xwe yan jî nexweşxaneyê. Divê mirov rasterast tenê di rewşên giran ên lezgîn de biçe nexweşxaneyê. Ji bo hemû rewşên din ên lezgîn ji bo saetên derveyî demên vekirîbûna mûayenexaneyan, Navendên Banga Lezgîn ên Bijîjkiyê (Medizinische Notrufzentrale, MNZ) hene. Mirov dikare roj 24 saetan bi riya jimara telefona 061 261 15 15 xwe bigihîne vê derê. Ji bo zarok û ciwanan derveyî saetên vekirîbûna mûayenexaneyên bijîjkên zarokan Medgate Kids Line ya bi jimara telefona nebelaş 0900 11 44 11 heye.

## Bijîjkên diranan

Bi gelemperî, divê hûn bi xwe mesrefên tedawiya diranan bidin. Lê derfeta çêkirina sîgorteyeke alîkar a mesrefên tedawiya diranan bigire ser xwe, heye. Ji bo zarokên diçin xwendegehê salê carekê mafê wan ê sehkirina diranan a belaş heye. Xwendegeh agahiyên li ser vê par ve dike.

## Nexweşxane / Ciyên rewşa lezgîn

Gava kesek divê biçe nexweşxaneyê (Spital), di piraniya rewşan de, ew ji aliyê bijîjkekê/bijîjkekî ve tê agahdarkirin. Rewşên lezgîn ên giran ên divê mirov rasterast biçe ciyên rewşa lezgîn ên nexweşxaneyan derveyî vê ne. Ger rewş xetereya jiyanî nîşan dide yan divê nexweş were hilgirtin, divê mirov telefonî jimara 144 a rewşa lezgîn bike. Ji rewşên lezgîn ên zêde ne giran, bijîjkên malê berpirsyar in.

## Lênêrîna li malê

Kesên nexweş an hewceyî lênêrînê yên pêdiviya wan bi alîkariya li malê heye, dikarin xizmeta derveyî nexweşxaneyan a lênêrîna nexweşan (Spitex) bixwazin. Kesên pisporên beşa xwe ji bo li wan binêrin an di karûbarê navmalê de alîkariya wan bikin, diçin malên hewcedaran. Ev derfet ji bo kesên ji ber nexweşiyê, qezeyê, kalûpîriyê, nerehetiyên ducaniyê an jî di dema zayînê de hewceyî alîkariyê ne, heye. Sîgorteya bingehîn (Grundversicherung) qismek ji mesrefan digire ser xwe. Li kêleka Spitex Baselê gelek xizmetgehên Spitexê yên taybetî hene.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/medizinische-versorgung

# Ducanîbûn / zarokanîn

Divê jinên ducanî mesrefên muayeneyên pêwîst bi xwe nedin. Mesrefa zarokanînê jî wê ji aliyê sîgorteya bingehîn ve were dayîn. Berî zarokanînê û piştî wê, dêûbav dikarin şêwirmendiya belaş bixwazin.

## Xizmetên ducaniyê û zarokanînê

Mesrefên xizmetên bijîjkiyê yên girêdayî ducaniyê an zarokanînê wê Sîgorteya bingehîn (Grundversicherung) bigire ser xwe. Muayene û sehkirinên birêkûpêk ên berî zarokanînê, zarokanîn bi xwe û lênêrîna hewce ya piştre hemû girêdayî sîgorteya bingehîn in. Divê jinên ducanî di demeke pêş de serî li bijîjkekê/bijîjkekî yan pîrikekê (hemşîreya alîkariya zarokanînê dike) bidin. Nexweşxane û pîrik jî, kursên amadekariya zarokanînê (Geburtsvorbereitungskurse) pêşkêş dikin. Ji bo koçberan kursên taybetî hene. Zarokanîn dikare li nexweşxaneyê, li zayînxaneyê an li malê pêk were.

## Piştî zarokanînê

Li Swîsreyê xwestina dayikûbavan a şêwirmendiya piştî zarokanînê ji rêzê ye. Ji bo vê ciyên şêwirmandiya dêûbavan (Elternberatungsstelle) heye. Ev agahiyan li ser mezinkirin, bixwedîkirin û lênêrîna pitikê dide. Şêwirmendî belaş e. Li ser muyeneyên piştre yên ji bo dayik û pitikê hewce ne, bijîjk an pîrik agahiyan dide. Çêkirina sîgorteya nexweşî û qezeyê (Grundversicherung, Unfallversicherung) ya herî dereng piştî sê mehên çêbûna zarokê pir girîng e. Ya baş mirov van sîgorteyan berî çêbûna zarokê bide çêkirin.

## Derzî

Tê pêşniyarkirin, ku di dema xwe de li hember nexweşiyên diyar derziyên hewce li zarokê bidin. Lêbelê derzîlêdan ne mecbûrî ye. Bi gelemperî sîgorteya bingehîn mesrefên derziyên tên pêşniyarkirin digire ser xwe. Bijîjkên zarokan an jî ciyên şêwirmendiya dêûbavan, li ser derziyan agahiyan didin.

## Jibergirtina zarokê

Li Swîsreyê di sê mehên pêşî yên ducanîbûnê de destûra jibergirtinê heye. Piştî dawiya hefteya 12. a ducanîbûnê, ger di warê bedenî û derûnî de tenduristiya jinê di xetereyê de be, jibergirtinek hîn mumkun e. Divê bijîjkek biryara vê bide. Keseke biryara jibergirtinê bide, mafê xwe yê şêwirmendiya belaş heye. Divê jinên ciwan ên kêmî 16 salî, serî li ciyekî taybet ê şêwirmendiyê bidin. Sîgorteya bingehîn hemû mesrefên xizmetên bijîjkiyê digire ser xwe.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/schwangerschaft--geburt

# Tenduristiya derûnî

Li Swîsreyê ti cudayî di navbera tenduristiya bedenî û ya derûnî de nayê kirin. Sîgorteya bingehîn lêçûna tedawiyên nexweşiyên derûnî yên li ba kesên pisporên beşê û herwiha lêçûnên mayîna li klînîkan dide.

## Alîkarî û şêwirmendî

Ji bo rewşên giran ên kesanî yan malbatî li Swîsreyê gelek kesên pisporên beşê yên alîkariya we bikin hene. Sîgorteya bingehîn (Grundversicherung) lêçûnên tedawiya nexweşiyên derûnî ya li ba kesên pispor ên bi fermî hatine nasîn ên wek derûnînasan dide. Lêçûna mayîna li klînîkan ji xwe tê dayîn. Pirsgirêkên kê hebin, ew dikare bê ku navê xwe bide û belaş serî li ciyên şêwirmendiyê bide. Destê alîkariyê (Dargebotene Hand) bi riya telefon, e-mail an chatê (Telefon 143, www.143.ch) şêwirmendiya we dike. Lê belê bijîjka malê yan bijîjkê malê (Hausärztin oder Hausarzt) jî dikare alîkariya we bike. Ger kesek bi awayekî zêde di xetareya, ku xisarê bide xwe yan bide hin kesên din de be, divê bi lez destwerdan were kirin. Di rewşên wiha lezgîn de polîs alîkariyê dike (Telefon 117).

## Zarok û ciwan

Ji bo ciwanên pirsgirêkên wan ên derûnî hene, xizmeta derûniya xwendegehê (Schulpsychologischer Dienst) ya belaş ciyê herî baş ê destpêka têkilîdanînê ye. Dêûbavên xema zarokên xwe dixwin jî dikarin serî li wir bidin. Alîkariya belaş û bê navdayîn ji bo zarok û ciwanan xizmeta banga lezgîn a zarokan bi riya telefon, e-mail an chatê dide (Tel. 147, www.147.ch). Ji bo rewşên lezgîn ên derûnî yên zarok û ciwanan, dêûbav dikarin bi riya telefona 061 325 51 00 serî li Derûnînasiya Zarok û Ciwanan (Kinder- und Jugendpsychiatrie) bidin.

## Nexweşiyên girêdayî kêşbûnê

Di rewşên nexweşiyên bi kêşbûniyê ve girêdayî de saziyên wek Alîkariya Kêşiyê ya Herêma Baselê (Suchthilfe Region Basel) û Ciyê Şêwirmendiya Kêşiyê ya Pirçandî ya her du Baselan (Multikulturelle Suchtberatungsstelle, MUSUB) alîkariyê dikin. Ev cî şêwirmendî û alîkariya belaş û bawerîdar didin. Gava mirov xema merivên xwe yan kesên nêzî xwe bixwe jî, mirov dikare têkiliyê bi ciyên şêwirmendiyê re deyne. Ev der şêwirmendiyê bi hin zimanên biyanî jî dikin. Di navbera nexweşiyên ji ber kêşbûniyê de ne tenê qala girêdayîna bi alkolê yan madeyên hişbir ve tê kirin. Ciyên şêwirmendiya kêşbûnê alîkariya derbaskirina kêşbûniyên din ên wek girêdayîna bi lîstikan ve (lîstikkêşî), girêdayîna bi kirînê (kirînkêşî) ve an jî girêdayîna bi internetê (internetkêşî) ve û nexweşiya xwarina zêde jî dikin. Pirs dikarin bi riya mailê jî werin kirin.

## Trawmatîzekirin

Kesên di jiyana xwe de tiştên xerab jiyabin û nikaribin vê yekê derbas bikin, divê ew ji bo xwe alîkariyê bixwazin. Ji ber ku trawmatîzekirin nexweşiyên derûnî yên giranbûyî ne. Li kêleka derfetên şêwirmendî û alîkariyê, ji bo pirsgirêk û nexweşiyên derûnî ciyên taybetî yên têkilîdanînê û tedawîkirina ji bo qurbaniyên şer û îşkenceyê hene.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/psychische-gesundheit

# Rewşa mirinê

Gava kesek ji malbata we jiyana xwe ji dest bide, divê hûn vê yekê ragihînin rayedaran. Ger hûn bixwazin wê rayedar telefonî xizmetguzariya cenazeyê bikin. Xizmetguzariya cenazeyê wê cenazeyê bibe goristanê yan jî bişîne derveyî welêt.

## Nîşandana mirinê

Gava kesek ji malbata we jiyana xwe jidest bide, divê bijîjkek belgeya mirinê dagire. Piştre, divê hûn mirinê ragihînin Saziya Rewşa Sîvîl a Kantona Basel-Stadtê.
Kesek li nexweşxaneyê, kalûpîrxaneyê yan li lênêrîngehê mir:

- Divê birêvebiriya nexweşxaneyê, ya niştgehê mirinê ragihîne Saziya Rewşa Sîvîl.

Kesek li ciyekî din mir:

- Divê hûn wek keseke, kesekî ji malbatê mirinê ragihînin Saziya Rewşa Sîvîl a Kantona Basel-Stadtê.

Her kesa, her kesê li kantona Basel-Stadtê dijî, bi awayekî belaş tê binaxkirin (Erdbestattung) an xweliya wê, wî dixin sindoqekê (Urnenbestattung).

## Vegerandina welatekî derveyî Swîsreyê

Dibe ku kesek ji malbata we li kantona Basel-Stadtê mir. Lê hûn dixwazin ev kes li derveyî Swîsre were binaxkirin. Ji bo vê, divê fîrmayeke fermî ya binaxkirinê girteyekê pêşkêş bike. Navê girteyê «Girteya Tabût û Mohrkirinê» ye. Divê hûn awayê orîjînal ê girteyê nîşanî buroya binaxkirinê ya kantona Basel-Stadtê bidin. Piştre buroya binaxkirinê pasporteke cenazeyê derdixe. Tenê bi vê belgeyê şîrketa binaxkirinê dikare cenaze bibe goristana welatê li derveyî Swîsreyê. Divê hûn wek kesek ji malbatê lêçûnên wê bidin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/gesundheit/rewsa-mirine